Gulbijêrek ji

# *Çîrokên Gelêrî*

*Amadekirin:*
***Metîn Kewê***

# RÛNÊ SIMBÊL

Hebû tinebû di gundê Qopê de malbatek hebû. Erê di nav ev malbatê de jî zilamek hebû. Rewş û debara ev mêrik nebaş bû. Feqîr û hejar bû. Lê xîzanî dikişand. Belê ev mêrik ne dixwest kes xîzanîya wî bizane û bihise.

Lê belê kengî derdiket dervayê, wî car simbêla xwe û devdora xwe bi rûn lêdikir. Ku herkes dev û simbêla wî bibine û bêje, ev kes savarê bi rûnî xwarîye.

Lê rojekî ev mêrik disa xwest biçe dervayê. Li ber derî solê xwe lixwe kir û li ber deri qîzê xwe re gazinç kir û qirya, *'keçkê min, ka rûna simbêlî min bine'* go. Keçkê wî jî bilez rûna simbêlî wî anî û got, *'hilde bavo'*. Bavê wî jî tilê xwe têxîste hûndîrê rûnê û simbêl û devdora xwe bi rûn kir, paşê jî çû çayxaneya gundî.

Keçik jî, rûnê simbêla bavê xwe bir û têxîste cîyê wî.

Di wî yalî de, mişk pêşî, di pîşîk jî paşîyê de direvîya. Lez û bez ber dora rûna simbêlê çûn. Piştre jî di wî bezdanê de rûnê simbêla mêrik kete xarê û rijya. Keçik û jina malê ew deng bihistin û hatin ev bûyerê ditin, piştê vê yekê, jinik; *'eywax! ew çi rewşe, malê me şewîtî. Ka ez çi bêjim mêra xwe'* got.

Nale nale jinik dom kir û keçik jî revîya dervayê, çû çayxaneya gundî. Û di wê derê de bavê xwe dit û di cem herkezî de wisa go; *'bavo welle rûna simbêlê te pîşîk êxîste erdê hemû rijand. Îdî tu nikarî simbêla xwe bi rûn ve xemlandî biki.'*

# HASO KUPO

Di rojeki de Haso û çen hevalên wî çûne malekî ji bo mêvantî yê. Hatin e ber derî

hineki rawestan, piştre jî deri lêxîstîn û hîvî kirin. Navmalî an jî kevanî derî vekir û mêze kir. Lê, çi bibine, di pêşîya xwe de zilamên bîyanî hene.

Ev zilamên biyanî yan jî Heso ligel hevalên wî jinik re gotîn, *'me gelek westîyane dixwazîn mêvanê we bin, hineki vewestîn û bêhna xwe hildin û pişti vê yeki vegerin biçin.'*

Maljin, *'belê çi dibe, xêra Xwedê kerem kin hûndîrê,'* go.

Jinîk tenê di malê de bû û li ji boy mêvan hezkirinê ev zilaman di malê xwe de pejîrant û qebûl kir.

Lê paşê navmalî mêvanê xwe re di hûndîrê tasê de hinek hingîv anî. Li piştre çû menzelê xwarînê. Lê mêvan jî, ev hingîvê bi noşî xwarîn û piştre jî dawî kirin. Geleki çejdar bû. Ji bo wî dilê wan disa xwest. Lê belê şerm û fedî dikin nikarin disa bixwazin. Belê di nav mêvanê de, zilamek jê Heso re, *'kuro welle hingivê me dawî bû, lê em hinek jî bixwazîn?'* Go. Heso jî; *'law qe dibe wisa, me re ew qas hingîv daye û diyarî kiriye 'bese, têra me heye*, *şerme lo!'* Hevalên Heso jî, gotînê xwe heter kirin û lê Heso xapandin.

Heso jî, dizîvaka çû cem kupê ji bo hinek hildanê hingîva moz ê. Û paşê rûnîşt ber kupa hingîv ê. Ber dorê xwe mêze kir û nêrî li piştre, kincê milê xwe bada û milê xwe dirêj kir û têxîste hûndîrê kup ê. Lê têxîstîna destê wî hinek dîjwar bû lê disa destê wî gihişt hingîvê. Heso hinek çendek hingîv girt û desta xwe xebatê derxîstînê kir û çi bibine destê wî dernakeve. Lê disa xebitî û destê wî disan derneket. Çi kir û nekir destê Heso nehat. Lê ji bo havarê hevalên xwe bi dizi ve gazî kir. Go; *'werin piştvanîya min bin, lê destê min di hûndîrê kupê de dernakeve.'* Hevalên wî ji bo alikarî hat. Lê belê alîkarîya hevalên xwe jî dit ev jî vala derket. Belê dest derneket.

Di wî demê de navmalî jî derket hat. Heso jî, kupê, di piştê xwe de veşart. Lê rûyê Heso sorîk û xwîdanî bû. Poşmantîya wî jî, di rûyê wî de duxîya.

Navmalî tîştekek şik kir û guman kir û bixwe ve got; *'barke di piştê ev zilamê(Heso) de tîşte heye.'* Gava hat çi bibine? *'Destê Heso di hûndîrê kupê de ye.'* Heso gelek şerm kir û sor bû lê piştê vê yekê, xemgînîya wî kifş bû. Li borîna xwe xwast. Û go; *'mixabin min zehf tîştekî şermî kiriye. Welle em pir birçi bûn û lewma ev hingîv têra me ne hat, me jî şerm kir dîsa ji te hingîv ne xwastîn û ketîne wî rewşê.'* Li paşê Heso gotînê xwe dom kir û go; *'Xwedê jî nepejîrant û wisa xwast ez bi kevîm e wî rewşê.'*

Navmalî jî, tîşte ne got û piştre kupê şikînand li destê Heso derxîst. Û Heso; *'ez benîya te me xwîşkê,'* go û paşê, *'dizan îm, min karekî gelekî nebaş û kambaxî kiriye. Lê ez gelekî xemgîn îm, tika dikim min bibore kevanî.'* Navmalî jî go; *'li borînate başe, lê çi hat ser hingîvê mim û ser kupê min hat.'*

Heso dîsan ber wî helya û go; *'lê kevanî ji boy Xwedê kesî re nebêje, ez gorî, gelê gundê me min re zehf dikenin, ez xax dibim û hetikînê bibim.'* Paşê zivîrî hevalên xwe re jî wekî wisa got. Maljin û heval ên wî jî, go; *'na, belê nabêjin kesî re.'*

Sîbê bû Heso çi bibine, herkes ji wî re dibêje; *'Heso Kupo'* tu çawayî? *'Hingîv çawaye,'* xweşe?

Belê di piştê ev bûyerê de navê Heso, Heso Kupo ma ye. Belê Heso Kupo jiyana xwe zude dest da ye. Lê niha jî di gundê Qopê û Soktîlîyê de nevîyên wî hene. Navê wan jî, nevîyê Heso Kupo ma ye.

# DIMS, MIŞK Û FIRAQÊ MÎZA PÎRÊ

Belê herkez jî dizane mêvan û mevantî di nav gelê Kurd de gelek girînge. Ji bo wî çîrok û kûrtçîroka wan jî zehf cûr be cûr e. Yanî kûrteçîroka ser mêvanî cûreye. Lê niha em jî kûrteçîrokê ser mêvanî ji we re biaxîfîn û vebêjin. Bi guman ev kûrteçîrok raste û çêbûye.

Di demekê bajarê Mûşê û li gundekî Qopê de zilamek, mêvanê yek malê bûye.

Navmalî kerema xwe kiriye û xêr hatî bavê min, ser sera û ser çava hati, gotîye. Mêrik jî bi kêfxweşî rûnîştîye.

Li piştê vê yekê navmalî çûye menzela xwarînê lê ji bo pêşkêşîyê xwarînê bike. Û li paşê di hûndîrê firaqek de hinek dims anîye. Lê zilamê mêvanê reben jî, ev dimsê dest pê ka xwarînê kiriye.

Li di wî encamê de zarokê keçek jî ber birayê xwe yê mezîn revîya û li ber dora mêvan jî gerîya. Lê belê lingê wan zarokan jî werqîlîyê firaqê dims bû û firaq jî wergerîya. Li piştre jî dims rîjîya ser tej  û cacimê. Lê di encamê rîjandinê de xaliçe hetikî.

Zarokê mezin jî gîlîya xwîşkê xwe diya xwe ra kir û wisa qîrîya; *'day day! Erê welle xwîşka min Rîndik, dimsê bi mîşk ê  rîjand ser tejê.'* Lo mêvan jî gîlîya zarok bi hisya û lê bi şêwî, bi şaşî û bi behitînê wisa got zarok re; *'çi çi dims çi bû'*. Zarok jî; *'Xalo gava li hûndîrê ev dimsê re mîşk*

*ketî bû, lê diya min jî ev dimsê jê te re anî.’* Mêrîkê mêvan jî hêrs bû û paşê ev firaqê bi hêrsî hilda û bi zexm û bi tûndî lêxîste erdê û şîkînand. Kevanî yanî navmalî jî bi havar hat û lê bê hay bûna xwe ev jî qîrîya û go; *‘weylê firaqê mîza pîrkê şikest.’*

# ZARO HIŞ BE,

# HA HA GUHÊ TE WISA BADIM

Di demekê zivistanê de lê malekî re mêvanek hatîye, ev mêvan jî lêzîmê wan bûye. Lê ev lêzîm jî ji bo mêvantî hatîye malê mervê xwe.

Herêm Mûşa Qopê bû. Li dem jî êvar bû. Mêvanê me jî di dema nanê êvarê hatîbû vê malê.

Kevanî sifrê û xwarînê amade kir û gazînca mêvanê pismamê xwe kir û piştre gazîya mêr û zarokên xwe jî kir.

Lê herkes rûnîşt ber sifrê, di sifrê de fîraqê xar, lê di hûndîrê firaqê xar de jî tijî savar hebû. Belê savar jî bi rûnî bû.

Lê belê,  ji bo piştê xar bûnê firaqê de rûn hemû herikîye alîyekî. Lê di ev berhevbûna alîyê rûn de jî mêvan hebû. Li rûnê hemî berhev bû cem firaqê mêvan.

Lê hinek xwarîn û paşê malmêrik jî çi bibine, hemî rûnê savar herikîye cem mêvanê wî. Mêra mal hinek raman kir û bixwe va wiha go; *'hemû rûn herikîye ber wî, gelo ez çawa ew rûnê binime nêzîkê xwe.'*

Li vê gavê zarokên wî jî har bû. Pişti vê yekê ramanek hate bîra mêrikê, lê wisa go û wiha kir; *'zarno har nebin! Welle guhê we wisa mina firaqê savar badim û bizvîrînim ha'*. Belê wekî wisa

kir, firaqê jî zivirand û rûnê berhevkirî anî ber xwe.

Paşê mêvan jî dit ku di ber wî de qe rûn nema. Lê zava rûnê hemû zivîrandîye cem xwe. Mêvanê pismam jî bixwe va welê go; *'bisekine tu dibinî ez çi bikim ji te re.'* Lê ev jî firakê pêgirt û got; *' welle ez kengî li vê derê bim tu qe nîkarî guhê birazîn min wisa bizvîrinî!'* Belê mêvan jî jirî derket û alîyê rûnê zivirand ber xwe. Piştê vê yekê savarê xwe yê bi rûnê bi noşî xwar.

# QÎZÊ ÇAY ÇÊKE

Hebû tine bû di demekê zivîstanê de malbatek hûrîk hebû. Ev balbat jî, hinekî xîzanî û belengaz bû.

Erê, li di her dem û roja êvarê de mêrika jin ango Zinaro jê ser karê û li ser xebatê dihate malê xwe, dirûnîşt û destên xwe jî têdixîste ser çoka xwe û paşê; ‘ *qîzê çay çêke!’* digot.

Lê car caran jî, jina mêrik Zêrîn jî çayê zelal an jî mina avek çay çêdikir mêra xwe ra û lê cem wî jî şekîrek tenê têdixîst. Û li hinekî bê dil ve jî, *‘de hilde çayê xwe!’* digot.

Mêrik jî binoşî çayê xwe bi şekîrê qîrtleme ve vedixwar. Lê di pêşya çayê de jî wisa digot; *‘ erê welle ser karê zehf diwest îm, li ev çay jî gelek rind vewestana mîn û bêhna min hildide.’* Li domahîya wî jî; *‘ jina min zehf başe lê’* digot.

Belê ev rewş piçkek dom bû û paşê roja êvarekî Zinar li xebatê hate malê xwe derî vekir û çû ser bergî runîşt û destên xwe jî çoka xwe lêxîst û paşê wisa; *‘qîzê çay çêke’* got. Jinikê Zêrîn jî bi hêrsa xwe qîrya û wekî wisa; *‘çiye ev lo tu her û roj ‘qîzê çay çêke’ dibêji û destên xwe jî wisa lêdixî ser çoka xwe.’* Got. Û disa mêra xwe ra gotîna xwe dom kir; *‘ lê salek bû nîv kîle çay û kîlokek jî şekîrê qîrtleme em hildan, şükür tu e van a jî xelaz û dawî biki?!.’...*

# CIYÊ MIN DI HUNDIRÊ AGIR DE BE

Dem dema zivistana tund bû. Lê zehf jî sar bû. Berf, bager, bahoz çi bigota hebû. Belê li her deri jî berf pêgirti bû.

Gava zilamek Mûşê jî di ev zivistanê de li dervayê ma ye. Lê belê ev zilam di dervayê de wenda bûye û gelekî jî cemidiye. Lê belê hemû tili û pêçîyên wî qeşa jî pêgirtiye.

Lêzim û merivên ev zilamê jî gelek di pêşya wî de geryane.

Rojeki ji rojen ev lêziman jî mervê xwe ditine.

Erê lêzimên wan ev zilamê cemidi hildane û birine malê xwe, li paşê di cem sobê de danin.

Zilamê me jî xwe di ba agirê de hinek germ kir û piştre zehf jî kêfa wî pê hat. Belê di ber xwe de jî heliya lê paşê wiha go: *‘Xwedê, ciyê min, ciyê bavê min û ciyê diya min di ev dinyayê de û dinyayê din de jî di hûndîrê agir de çêbike inşela.’*

# PÎRÊYA BI RÊYA XWE DE DIÇE

Rojekê kalek di bajarê Mûşê de ji bo pênsid beranê xwe re çil kile xwêyê kevir hildaye. Ev kalo, xwêyê kevir bar kiriye ser kerê xwe û dibe zozanê ji bo beranê xwe re.

Di hevrazê de ciwaneki zilamê mêrik ev kalo dibine û dinêhêre ev kalo gelekî westiyaye û xwîdana wî jî herikîye. Paşê ciwanê zilam dipirse: *'Xalo! Di ser kerê te de barek heye ev çiye?'* Kalo jî: *'Çi dibêji zilamo!'* gotiye. Ciwanê delal jî: *'barê te çiye? Dibêjim xalo!'* Kalo jî: *'Welle zilamo, min çil kile xwêyê kevir stand ji bo alêsandinê beranê xwe re. Ey xortê*

*delal, ev e barê min’* gotiye. Zilam jî wisa go: *‘Xalo lê di wî yali da jî çi heye?’*. Kalo jî welê go: *‘Xortê delal, ev jî çil kile kevire min têxistiye.’*. Zilam di bi şaş û paş de ma û go: *‘Xalocan tu ev kevira çi biki?’* Kalo jî: *‘ciwanê zilam, di barê kerê min ê aliya din de çil kile xwêyê kevir heye. Lê wî yali re jî min çil kile kevir têxist lê ji bo giranîya barê ker wekhev be’* got.

Belê di paşiya ev mijulbûnê de zilamê alikarhez ev bûyerê re dest da. Kevirên hemû derxist û avite erdê. Lê paşê xwêyê kevir derxist û du par kir li pişt re jî bi şêweyeki wekhevî têxiste ser kerê. Pişti vê bûyerê kalo tişe fêm nekir û di ser rêya xwe de çû.

Kalo dît ku barê giraniya wî sivik bûye. Û bi xwe ra di hûndîrê xwe de *‘barê me ça sivik bûye lo, Xwedê ev zilam re razi be, lê spas wî re’* got.

Paşê disa bi xwe re wiha go: *'belê ev ciwan çawa jirêye û bi aqîle. Lê beranên min pênsid hebe, barke yê wî jî, yê min zehftire'.*

Piştî vê yekê kalo rawesta û di ber xwe de zivirî û qîriya: *'wa xortê delal ca lazeki binêhêre!'* Xorto rawesta û nêrî li paşê; *'çi xalo!'* Go. Xalo jî wisa go; *'bibore çend beranê te hene?'* Zilam jî: *'Xalo qe tineye. Lê tenê çêlekê min hene ev jî debara min e'* got. Lê di pişti gotina zilam de, kalo bi xwe re wiha vegot: *'na na ev zarok, ji min bi aqîltir û jirtir nine. Ka binêhêre qe beranê wî tineye.'* Piştre rawesta û wiha got: *'Ez disa di rêya xwe yê zanin de biçim'.*

Belê kalo diçe hemû kevirên avitî hildide û barê kerê xwe dike. Xwêyê kevir jî hildide têdixe aliya din ê.

Pişti vê yekê serê xwe hildide diçe rêya xwe.

## ŞÊXA SOR

Belê rojekî bi roj,  tirîyê çerçiya Xizanê, hatiye  gundî Kekeli. Ev Şêxî Sor jî, ev tiriyê selikê bi selik va diziye.

Gava  xwedîyê tirî û gelê gundî bi hev ra gelekî geryan û piştê ew gerinê tirîyê çerçîyê gelê Xîzanîyê ditin. Lê belê ditin ê xwe de çavê xwe re bawer nekirine. Çi bibinin rinde ev selikê tirî di mala şêxa sor de ye. Lê dibinin ku şêxa mala sor dizvan e.

Gundî mezinan cezayek diramine û biryarekî hildidin û dibêjin; *‘ev şêxî sor ev selik va di nav gund de bigere.’*

Li paşê ev selikê piştê şêx ra bar kirin şêx jî di hûndirê gundê de wisa yanî selik ve gerya û rezil û riswa bû.

*“Diz her roj dimire, lê mirovê baş yek car dimire.”*

# MIROVAN ŞÊXA ŞÊX DIKE

Di bajarê Bilisê sala 1975'an de malbatek hûrik hebû. Di ev malbatê de mêrikek gotiye; *'ez çi bikim, bavê min bimire ez tune dibim. Ez jî derewek bavêjim gundi ra û bibêjim bavê min şêxe.'*

Belê bavê wî Remezan zana bû lê belê şêx nebû.

Kurê Remezan çû gundê xwe û herkezi ra go; *‘bavê min şêxe. Pawula pirê çay vê êvarê min dit ku bavê min pinemêja xwe dervayê raxir û firya çû Qibrisê şer kir û paşê sibê disa hat û di binçengê wî de jî tiji gule derket.’*

Gelê gund şaşû paş de ma. Kurê remezan disa go bavê min zehf ji xeribe nabêje ez şêxim.

Gelê gund çûne ba Remezan û bihevra gotin; *‘barke tu şêxî. Lê tu ser nimêj ê de çûyî Qibrisê şer kiriyê û disa hatiyê vêderê û gule jî aniyê pawula.’* Remezan jî; *‘na law ez şêx mêx nin im. Lê nikarim nimêj jî bikim. Gundîno ez nexweş im çawa biçime Qibrisê.’*

Kurê remezan jî wisa go; *‘ hevalan bavê min kerameta xwe nişan nade zehf dilê nizme. Ji bo wî nabêje ez şêx im. Hûn bawer nekin’*

Belê di salê din ê de Remezan mir çû dilovanîya Xwedê. Û gotin; *‘şêx Remezan miriye.’*

Belê plana kurê Remezan destpê bû û ev jî bû *kurê şêxa Remezan*.

# BAWERIYA GUNDÎ

Bajarê Muşê û di gundeki Qopê de gundîkeki Tirtopê hebû. Ev mêrik nevalê gundî de darek qizilcik dit. Ev dar geleki hevce bû. Rint çerx û şeyt a gerdûnî dibû. Lê belê hûrik jî bû. Bixwe va; *'ez ev darê girîng jê bikim'* got. Piştre go; *'na na ev dar bihaye û geleki hevceye lê ez çawa bikim ku ev dar mezin be û gelê gundi ev dar jêneke, paşê ez jê bikim.'*

Ev zilam nezaniya gundî û bawerîya çewta gundî zanî bû û paşê tişteki hate bîra wî û wisa go; *‘ez ev desmalê xwe li ser ev darê qizilcik re girêdim paşê gelî gundî jî girêdide, piştê vê yekê kes jî ev darê jê nake.’*

Sê ro dawî bû, rê ya ev zilam jî cem wî darê derbas bû. Zilam ê Tirtopê ku dit û çavê xwe bawer nekir. Ser darê qizilcik desmal va tije bûye.

Pênc şeş sal dawî bû, zilam şevek çu ev darê hêja û biha jê kir barê gerdunê gamêşa xwe kir û bir malê xwe. Paşê xwe ra şeyt yanî çerxê gerdunê gamêş û gerdunê hespa kir û deh salan bikarani.

# SÊ XWIŞKÊN DÎNIK

Li bajarê Mûşê û gundeki Kopê di Soktili de sê xwişkê din li di mal de mayin hebû. Belê ev keçan hinekiî jî din bû. Lê kê dihat ji bo xwazginiyê wan, ew keçan hineki lal dixeberdida paşê ew xwazginîyan bi zû radibûn û diçûn. Bavê wan jî dixwestîbû keçên wî jî bizewîcin.

Lê kes wan a naxwaze. Ew sê xwişk jî nikare bizewice.

Lê roj bi roj derbas bû bavê keçan jî ji wan re; *' keçên min, ji bo xwestina we herkes tê, lê hûn bi lalî diaxifin û tevgêra dinbûnî dikin paşê ev mêvanan rewşa we dibinin we naxwazin direvin û diçin. Lê niha jî ji bo xwestina we xwazginîyan werin. Hûn kêleka diwwarê runin ber xwe danê diwarê bikin û tu car dengê xwe nekin. Kê bê deng be û deng venede ez ev a bizewicinim'* go.

Belê dema xwestin hat. Xwezginîyan kerem bûne hûndîr. Li paşê mijulbûn û gilingê gazincê xwe kirin. Bi hev re çay bi kirtleme vexwarin.

Mixabin ev di rind çûyîna axaftinê de buyerki balkêş çêbû. Lî mijulbûn û xeberdana xwedî mal û mêvanê

xwezginîyan, ji nişka ve jê bû û herkez bê deng ma. Baldarîyên hemû ew keçan ket.

Balkêşe li  cem keçan mişkek reviye lez û bez çûye kulêka menzela xwarînê. (Lê belê mêvan mişkê nabine lê rewş û halê keçka dibine.)

Belê di derbasbûna ev mişkê de xwişkan wiha qîrya;

Xwişka mezin bi qirînî; *'a ha mişt mişt',*

Xwişka yê din jî; *'welle tete tulê tete tulê',*

Xwişka biçûk jî; *'şutur mutur min dendê xwe netir, mêrî xwe tir'.*

Belê xwezginîyan rûyên xwe tirş kir û bi dilên xwe da; *'wan keçkan dine'*

gotin. Paşê bi zû rabûne ser piya li rêdan xwestin û derketin çûn.

## MIN ZANÎBÛ MIN ZANÎBÛ

Di demekê de malbatek Mûşî hebû. Erê di ev malbatê de jî keçek civanê bedew dijiya. Ev keçê bedew jî evînê xortekî bûye. Dilê wî jî(Şilî) ji bo na wî(Baran) şewîtiye. Şilî, ji bo na Baran dimire.

E van a jî roj bi roj bi dizivaka dihatin berhev.

Di rojeki de aşîqan xeberdan gotin; ‘*wisa nabe*’, paşê biryar girtin û gotin; ‘em birevin’. Piştê vê yekê ev keç û xort di şevê nîvî de reviya.

Sibê bû diya keçê dinihêre *Şilî* tineye. Menzela dinê digere û qîzê xwe nabine. Li paşê revina qîzê wî tê bira wî û diqîre. Di piştê ev qîrînê de herkez belav dibe.

Di wî encamê de bavê Şilî jî hat. Bav jinê xwe re; ‘*jinê çi bû*’ got. Jinik jî wisa go; ‘*mala min şewîtî Şilî revi Şilî revî*’. Bêguman bavê Şilî gelekî hêrs bû. Jinik di cikê de digirî mêrik jî di alîyê de. Belê dengê jinik mêr re hat, lê wisa digot; ‘*min zanîbû min zanîbû*

*Belê jinik di wî şilpinê de kete erdê. Mêrik jinê xwe re; ‘qey tu zanî bû çima asteng nebû yan jî min re negotî’.*

*Jinik jî wisa girya û go; ‘min çi zanîbû min çi zanîbû’...*